

KEPİR

Kovareka heyvane ye bo zarokan Dezgeha
Spîrêz bi harikariya Diyakonya li Duhokê
derdiket.

Jimare
43

şîvat
2007

Xwedan imtiyaz : Dezgeha Spîrêz

Peyva kepîr

Sernîviser:
Muâyyed Tayîb

Nîgar:
Neomeddin Birî

Berhênan:
Beyar Cemîl,
Neomeddin Birî

Tîpçînin:
Mesûd Giravî

Serpereşuya
Şapec:
Nîzar Reşad

Peydakirina pirtukan û berhevkirina delîve û ke şubayekê guncayî û handana zarokîji bo xwandinê erkekê dayk û baban e û mafekê zarokan e. Lê mixabin gelek dayk û bab wesa hîzir diken ku ji bili xwandina kitêbên xwandingehê, her xwandinaka dî ya bê mifaye û divîya zarok demê xwe pê derbas neken.

Beri' heyamekî babekî gote min:

"Ez her hevy Kepre ji bo zarokên xwe dikirim, lê ez heldigirim heta dibe bêhnvedana nîva salê, paşî ez hemuya bi pêkve deme destê wan. Bi vî rengî, ez ne wan ji xwandina Kepire bê bar dikem û ne jî dîhêlim ku karekê nerêni li xwandina wan bibe, ma ez baş nakem?!

Ez bi vê gotinê - bi rastî - guhşîm û çend çirkeyeka bê deng mam, paşî min gotê:

"Dê hêsta baştır be eger tu xew û xwarina wan jî bo bêhnvedana serê salê paş bêxî! Mala te! Péwîst naket tu hinde zarokên xwe bigivêşî. Paşî te divêt ez bawer bikem ku ji bili xwarin û xewê demê dî hemu bo xwandinê ye?!

Ez têdigehim ku divîya dayik û bab xemê ji zarokên xwe bixwen û çavê wan li xwandingeha wan be. Lê bastrîn harîkarî dayk û bab pêşkêşî zarokên xwe biken ewe ku wan fêr biken çewa demê xwe li ser erk û arezuyêñ xwe belav biken û bila hemu dayk û bab di piştarst bin ku ew zarokê kovar û kitêban dixwihe dê xwandinâ kitêbên xwandingehê jî li ber bi sanaher be û li xwandingeha xwe jî yê serkeftir be.

Heta jivaneka dî hun şad û Kepira we ava
Sernîviser

Dînak-Yazîfîya Sernîviser Nûşîyanî Ferîdauna - Goya sayyam

Tel: +91 98402 72221 - 25-725278

E-mail: Nûşîyanî@Goya.org

Goya Sayyam - P.O. Box 2000